

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (159) Sal 29 30 Avrêl 2024 z - 2636 k Êmêl : Newroz@yek-dem.net Buha (100)L.S


# 13 sal in… Hê jî Sûriya Di qeyranê de digevize!



## Desteya sernivîser

Eve 13 sal in ku gelê Sûriyê, bi hemû pêkhateyên xwe ve, di agirê şerekî wêranker û xwîndar de dijî, şerekî wisa ye ku, di van salên xwe yên dirêj de, gel piştxûz, perîşan, penaber û bêrûmet kiriye. Li gora ku amarên fermî yên aliyên navdewletî tekez dikin, ta niha, derdora milyonek mirovî hatiye kuştin, birîndarkirin û windakirin, bêtir ji nîvê gelê Sûriyê ji xak û zeviyên xwe hatiye bidûrxistin, mişext û penaber bûye, li biyanî, derbideriyê, di bin konên bêrûmetiyê de, ew derd, êş û azarên giran dikişîne. Aboriya welêt tarûmar bûye, birçîbûn û xemgîniyê hawîr konên xwe yên reş vegirtine, bê ku hêzên mezin ên xwedî gotin û biryar dermanekî ji vê êşa wî ya dijwar re peyda bikin!

Wekî çawa ji mêj ve Kurdan gotiye: «*Agir bi mala yekî ketibû, yê din ser û pê li ser dikizirandin!*» Vêca, wilo bi serê gelê Sûriyê hatiye. Di vê qeyrana malwêran de, ….. 2

## Di Hilbijartinên Şaredariyên Turkiyê de, Kurd Biser Ketin!

**Newroz**

Li roja Yekşemê 31.03.2024-an, li seranserî Turkiyê, hilbijartinên şaredriyan dest pê kirin, di encamê de, gelek şaredarî ji dest Partiya Serokomar Receb Erdogan(AKP) çûn, nemaze yên bajarên mezin mîna Istanbol, Anqere û Izmîr, ku bûne para CHP ya rikber, herweha, li seranserî Turkiyê dengên AKP kêm bûn û ji pileya partiya yekem, bû partiya duyem. Encamên fermî yên dengdanê wiha bûn:

CHP: 37.76%, AKP: 35.42%, Refah: 6.14%, Dem:5.7%, MHP: 4.99%

Digel kêmbûna dengên DEM Partiyê, ya ku eve çend sal in di fişareke giran û hoyên dijwar de xebata xwe berdewam dike, bi sedan endamên ….. 2

## BÎRNAMAKe NERAZÎBÛNÊ...

**Ji birêzên endam di Perlemana Ewropayê de re...**

Ji destpêka kirîza Sûriyê ve (sala 2011an. Z) Turkiyê bi karanîna zorê û hêza leşkerî/serbazî destêwerdan di rewşa Sûriyê de kir, û ta niha jî berdewam e, û destêwerdana herî hişk û sert, êrişa wê ya bi hevaltiya milîseyên «Islamî» yên tundrew li ser Herêma «Efrînê/Çiyayê Kurmênc» bû (20 Rêbendana/ Çileya 2018an. Z), paşê dagîrkirina wê ji herêmê re (/18/ Avdara 2018an. Z), dû re jî dagîrkirina wê ji herdu herêmên «Girê Spî» û «Serê Kaniyê» re (/20/ Cotmehê 2019an. Z), û bikaranîna tewanên herî qirêj û genî li wan herêman, di dermafê keç û lawên gelê me yê Kurd, mîna: (Kuştin, îşkencekirin, ….. 4

**Di Hilbijartin... Dûmahîk**

**wê têne zindankirin, ku hê jî birêz Selahedîn Demirtaş di zindanên Turkiyê de, li gel hevalên xwe, li ber xwe dide jî, lê vê partiyê gelek şaredarî bidest xistin.**

**Li parêzgeha WANê, nemzetê DEM Partiyê birêz Abdulla Zeydan ê ku sala 2015-an endamê Parlemanê Turkiyê bû, digel birêz Selahedîn Demirtaş û hin hevalên xwe, hate zindankirin û piştî 3 salan serbest hate berdan, bû berbijêrê DEM partiyê, û di encamê de wî 55.48% ji dengan bidest xist û bi rêjeyeke bilind li pêşiya nemzetê AKPê bû; lê, bi bihanene derew, komîta hilbijartina xwecihî ew ji mafê wî bêpar kir, û ferman da ku nemzetê AKPê bibe şaredarê bajarê WANê; lê,**




**xelkên bajêr bi girseyî serî li ber vê biryara kîndar hildan û xwepêşandanên mezin lidar xistin. Li bajarên Kurdistanê yên mezin ên d in jî xwepêşandan lidar ketin. Partiya CHP ev kiryar şermezar kir, DEM Partiyê jî gilî li hember komîteya bilind a Hilbijartinan kir û belgeyên xwe pêşkêş kirin, û bi saya xebat û têkoşîna gelê Kurd di ber mafên xwe de, Komîteya bilind a hilbijartinan, Şaredariya mezin a Wanê li birêz Ebdulla Zeydan vegerand; û ev ji bo gelê Kurd û Bakurê Kurdistanê rojeke dîrokî ye!**

**Bi vê serketina mezin, herdu partiyên bira li Sûriyê, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEÎTÎ) û Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Pîroznameyek ji DEM Partiyê re şandin, li jêr deqa wê ye:**

### Pîrozname

**Xwişk û birayên hêja di serkirdayetiya Partiya Wekhevî û Demoqratiya Gelan de (Dem Parti)...**

**Silavek rastgo...**

**Em di herdu partiyan de, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê û Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê, serkeftina we ya di hilbijartinên şaredariyê de, yên ku di /31/ Avdara 2024an de hatin kirin, pîroz dikin, û hêviya pêşketin û serkeftinê ji xebata we re dixwazin di xizmeta dozên civakê û berçavkirina doza Kurdî ya dadmend ji bo cîbicîkirina binyadên aştî û dostaniyê.**

**Qamişlo / 3 / 4 / 2024 Z - 2636 K**

***Komîta Rêzanî ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî).***

***Nivîsgeha Rêzanî ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê.***

---

**13 sal in ... Dûmahîk**

bi armanca bidestxistina berjewendiyên xwe, hin dewletên herêmê yên mîna Turkiye, Îran û hin dewletên Kendava Erebî, vî agirî tevdidin û pif lê dikin, rivîna wî bilind dikin, çiqasî gel bête şewitandin jî, ji wan re ne derd û ne xem e! Ango mirov dikare bibêje ku ev dewlet, digel hêzên cîhanê ên mezin ku, destêwerdanê di vê qeyranê de dikin û derbasî welêt bûne, hemû jî, ser û ber, ji bo berjewendiyên xwe hatine, û li gora wê tevdigerin, û ta roja îro, ew naxwazin ku ev agir vemire, hêminî û aramî li welatê me cîwar bibe, gelê Sûriyê di siha rijêmeke demokrat de bi aştî bijî.

Piştî şerê Rûsya û Okrayîna ji hêlekê ve, û vê paşiyê şerê Israyîl û Hemasê li Xezayê ku, her diçe gol vedide, hewldanên navdewletî ji bo dîtina çareseriyeke aştiyane ji qeyrana Sûriyê re qels û lawaz bûne, û nema ew ji pirsgirêkên sereke tê jimartin. Her wiha çiqasî nakokî û dijberî di navbera dewletên Rojava bi serokatiya Amerîka û Rûsya de mezin dibin, ewqas, pirsgirêka welatê me Sûriyê jî aloz dibe, çareserî bidûr dikeve, qelen û bace girantir dibe!

Ji hêleke din ve, rûyê rastî yê Rikberiya çekdar a Sûriyê ji civaka navnetewî re aşkere bû, bi zelalî hate xuyakirin ku ta kîjan radeyê ew di destê dewleta Turkiyê de bûye amûreke erzan, li gora xwestek û berjewendiyên xwe, dûr ji berjewendiyên gelê Sûriyê, lê dijî doza gelê Kurd û mafên wî yên rewa, ew wê bikar tîne, ku ev jî dibe yek ji hêmanên domandina vê kêşeya bi êş û jan.

Rast e îro Efrîn, Girê Spî û Serê Kaniyê ji bal dewleta Turkiyê ve hatine dagirkirin, gelê me tûşî îşkence, girtin û kuştinê dibe, deverên wî yên dîrokî ber bi guhertina demografî ve diçin, û çeteyên bi Turkiyê ve girêdayî kiryarên hovane li dijî hebûna wî dikin jî, lê ew bêhêvî nebûye û tucarî bê hêvî nabe, ji ber ku xebat û berxwedan jiyan e, bi bawerî ew paşeroja xwe radestî neyarên hebûna xwe nake, û ji bo azadî û serfiraziya xwe, bê dudilî, her ewê têbikoşe!

Di vê qonaxa hestiyar de, ji me hemiyan tê xwestin ku bi xwendineke nû li xwe vegerin, nerîn, cîgeh û helwestên xwe, li gora demê, binirxînin û em berjewendiya netewî û ya niştimanî bidin pêşiya berjewendiyên partiyane, û ev yek ne tenê bi gotinê be, lê belê divê ew di pratîkê de cihê xwe bibîne, û eger vîn, bawerî û dilsozî hebe, ew karekî pêkan e.

Vêca, de em hemû bi hev re, bi yek dengî, berê xwe bidin aliyên ku windakirin û tunekirina gelê me ji xwe re kirine armanca sereke, em nakokiyên xwe yên hûrik li şûn xwe bihêlin û, mil li mil, kar û xebatê bikin; em çand û gotara rêzgirtin, lihevkirin û hezkirinê belav bikin, û civaka xwe ji nexweşî û ramanên çewt ên malwêranker rizgar bikin, ji bo vê dozê, em gavên pîvayî bavêjin!

# Azadî Zanava Min e



**Kalê maratê**

Bi hest û ramanên gava pêşîn.

Her destpêkek bi hest û ramanên di asta evînê de, dema xwe li peravên dilê mirovan dide, di giyanên mirovan de teqînên volkanîk çêdike. Li gor ruhê wê dem û kêliyê riyên nû peyda dibin, peywirên nû pêşberî mirov...

Di şiveqa avarekê welatê min de pêkanîna karkeriya demê pîroziyan li giyanê min ê neteweyî bar dike, hema destên min bigihin ku dixwazim li wir kulîlkan biçînim di binê her lat û zinarekî de, di ber û singê her dar û warekî de, hema berê min bi kîjan aliyê welêt bikeve, bi tîna agirê Newrozê divê ez hemû qirêjiyan bişewitînim û wê xûliya ji ber mayî li wê axa pîroz bireşînim, û ji wê axa şewitî bi baweriyeke têrpaqij ji nû ve jiyaneke azad bafirînim. Ramanên ku ji vê baweriyê re pêşengiyê dikin ji agirdadiyên zerdeştiyê tîna xwe şikandine, di rojeke ku rûqalî 4ê nîsanê de dibe dixwazim di wê evîna nûranî de hestên xwe bihewînim .

**Xwedî armancên mezin**

Hêstên min ên giranbiha hene, ku bi vegotina çand û zimanê min ê dayikê hatibûn meyandin, ji bo em li her serdemekê wateyeke zêrîn bar bikin. Hema bibêje bi neynûkan dîwar hatin kolandin, li dijî her cureyên hovitiyên serdestan, girêdana bi kokên xwe ve pir bi wate bû. Zarokên welatê min kêlî bi kêlî berxwedan bi jiyana exlaqî û polîtîk hunandin. Di navbera dîroka kevnar û roja me de navê bindestan bi tîpên zêrîn hatin neqişandin. Ew dergûşa mirovahiyê ya ku di pêsîrên vê axê de hat mijandin. Divê bi tu awayî dagirkeriyê li ser vê axê nehewîne. Xwediyê serpêhatî û armancên mezin im. Bi dehan bi tofanan re rû bi rû bimînim. Bi sedan di komkujiyan re derbas bibim. Ji nû ve xwe ji axa bermayî depeyda dim (dixuliqînim). Ez heyva nû ya zêrîn im. Wekî her carê dîsa jî strana li ser ziman im. Axa bi xêr û bereket e, xwedî gelek berhemên dayika xwedawend im..

Îro evîndarê baweriya jiyana azad a bi hev re û dilsozê ramanên neteweya demokrat im. Xwedî reng im. Bi nav û deng im. ji roja, ku roj ji lûtkeyên çiyayan bilind. Ez dibim qêrîneke xwedî hezar awaz û deng .

**Encama bêhempa**

Dengê min olan dide, li qadên welêt bi dengê, ku ji dûr ve tê govenda azadiyê tê gerandin. Keserên dil yek bi yek tên revandin. Êdî şabûn diyardê ye di kene. Li ser lêvên zuhayî veşartî de her demsal bihra e. Di Paxila min de veşartî. Stêrk di porê yarê de neqişandî. Kezî bi kezî hûnandiye, sebra min ji çavên li rê maye re mizgîni ye .

Roja min gulrengdar im û bi hezar im xwedî armanc û bi biryar im . Azadî zanava min e ku ji serhildana newrozê dixuliqe tîrêja di taritiyê de ye dibiriqe ...

Heta ku ew zanav hatiye bidestxistin hezaran canan di oxira wê de can dan kirin baxê bilbil û şeyda wekatê rengîn Kurdistan kirin deryaya evîn û sewda bûne dermanê hemû kul û derdan û wiha qîriyan li her çar dor û Milan:

Encam dê bêhempa be mizgîniyê bidin Roja me ...

# Li Cindêrisê: Ciwanekî Kurd bi Hovîtî Hate Kuştin!



**Newroz**

Êvara roja Çarşemê 13.03.2024-an, laşê ciwanê Kurd Ehmed Me›emo, yê /16/ salî, di bîreke avê de, nêzîkî gundê Til-silore, navçeya Cindêrisê li Herêma Efrînê hate dîtin.

Piştî lêkolîn û lêpirsînê, diyar bû ku ew gênc li ser destê kesekî bi navê Yamin Ibrahîm, ê ku yek ji biyanên devera Idlibê ye û ku li Çiyayê Kurmênc cîwar bûye, bi kêran hatiye kuştin!

Hêjayî gotinê ye ku sebaretî vê tewana hovane, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) û Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê, dxuyaniyeke hevbeş ji raya giştî re belav kirin, ji hemû hêzên siyasî, rêxistinên civaka civîl û yên mafên mirovan xwestin ku li dijî vê tewana mezin dengên xwe hildin, da ku dewleta Turkiyê a dagirker û çekdarên xwefiroş ên pê ve girêdayî, kuştina Kurdên Efrînê rawestînin, û daxwaz kirin ku Turkiyê hêzên xwe yên leşkerî ji xaka Sûriyê vekişîne.

Serê gelê Kurd sax be, bila dawî ji sitemkariya dewleta Turk a dagirker û hêzên tariyê re were!

**BÎRNAMAK... Dûmahîk**

dizîn û talankirin… HWD) ên ku digihêjin asta tewanên li dijî mirovahiyê û tewanên şer.

Bombebarankirina wê ya Roja Duşemê jî (/25/ Berfenbara/ Berçileya 2023an. Z) weke berdewamî û tewawkirin ji wan êrişên berê re hat, û çekên asîmanî yên Turkiyê hinde cîgehên istratîcî û giyanwerî li Herêmên Kurdî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bombebaran kirin, nemaze binevahî/ binesazî mîna stasyûnên zayenda elektrîkê, gazê û avê, û hejmarek ji çêgehên/kargehên sivîlî û xizmetguzarî û nexweşxane jî jê…Û di encama wan êrişan de heyşt hemwelatiyên sivîl û bêguneh şehîd/pakrewan bûn û pircarkî bi qaserî wan birîndar bûn, û rewşa hin birîndaran jî metirsîdar e, ji bilî wê jî roxandin û tarûmarkirina ku gihîştiye wan çêgeh û kargehan, tirs û xofa ketiye nav nişteciyên aştîxwaz, têvedan wan bi aliyê koçberkirineke zêdetir û devberdana ji herêmên wan ên dîrokî, û herweha jî valakirina herêmê û cîbicîkirina guhertina demografî ya rêbazkirî.

Behaneya «Parastina ewleya netewî» ya ku Turkiyê pêşkêş dike û dixwaze pê êrişên xwe ji herêmên Kurdî re (li Bakur û Rojhilatê Sûriyê) rewa bike, derw e û tenê nîşana nijadperestiya di dermafê Gelê Kurd de û dijminatiya wê ji hemî destkeftiyên ku pêk tîne re ye, û weha jî rêbazkirina siyaseta «Ji hev cuda bike tiwê biser kevî» di nav pêkhateyên Gelê Sûriyê de.

Êrişên Turkiyê (yên li dû hev) aşkere hêminiya rêjeyî ya wan herêman gef dike, bingehên aştî û aramî û jiyana hevbeş di nav pêkhateyên herêmê bi giştî de derb dike, ked û hewildanên şerê li hember rêxistinên terorîst û di pêşî de Rêxistina Dewleta Islamî li Şam û Îraqê «Da›işê» lawaz dike, waran li pêş geşkirina «şanên xewkirî» vedike da ku ji nû ve bêne geşkirin, vê herêmê û «Rojhilata Navîn» bi giştî berve geregoşî û netebatî/ nehêminiyê têve dide, û herweha jî dibe kend li pêş hewildanên dîtina çareseriyeke siyasî ji kirîza Sûriyê re, bi riya guftûgoya ku em dibînin ew kilîta çareseriyê û guhertina Sûriyê ber bi dewleteke rengeren û nenavendî ye.

Li gorî tiştên hatine pêşkêşkirin, em vê bîrnama xwe pêşkêşî perlemana we ya rêzdar dikin, bi hêviya ku hûn tevî hevkar û ortaqên xwe yên navdewletî di doseya Sûriyê de, li ser van xalan kar bikin:

1- Şermezarkirin û pirotestokirina êrişên Turkiyê li ser Herêmên Kurdî, û zext û fişarkirin li ser Hikometa Dad û Geşepêdanê (El›edalê we El-tenmiyê) ji bo sekinandina wan êriş û piroseyên serbazî/leşkerî.



2- Zextkirin li ser Destlatên Turkiyê ji bo rêzgirtina zagonên navdewletî, têkeliyên qenc ên cîrantiyê û serweriya Dewleta Sûriyê.

3- Bidawîkirina dagîrkirina Turkiyê ji hemî Herêmên Kurdî yên dagîrkirî re li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, û vekişandina wê ta sînorê navdewletî yê ku bi fermî mikûr pê tê.

4- Avakirina herêmeke parastî ye navdewletî li herêmên Kurdî, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

5- Qedexekirina firandina balefirên cengê li ser Herêmên Kurdî, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

6- Livandineke lezgîn ji bo şopandin û serjimartina hemî roxandin û tarûmatkirinên ku dijayetiyên Turkiyê bûne sersebeb, bi riya şandina komîteyên lêgerîna rastiyan.

7- Cîbicîkirina biryara navnetewî nimre /2254/ û biryarên navdewletî yên girêdayî çareserkirina doseya Sûriyê, weke çareseriyeke dawî ji kirîza Sûriyê re.

Aliyên imze kirine:

1- Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê – (Rêxistin Ewropa).

2- Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (El›partî) – (Rêxistina Ewropa).

3- Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê - (Rêxistina Ewropa).

4- Partiya Cep a Kurd li Sûriyê – (Rêxistina Ewropa).

5- Tevgera Çaksazî/ El›îslah – Sûriya – (Rêxistina Ewropa).

6- Partiya Lihevkirinê/ El›wîfaq a Demokrat a Kurd El›sûrî-(Rêxistina Ewropa).

7- Pilatforma Kurdên Sûriyê.

8- Komela Hêvî ya Kurdên Sûriyê li Holenda.

9- Desteya Yasayî/ Zagonî ya Kurdî.

10- Toreya Diyaspora Kurdên Sûriyê li Ewropa.

*4ê Rêbendana/Çileya 2024. Z - «Biroksel»*


## Rawestandek Şermezakirinê


**Bi boneya kuştina xortênşazde salî yê ku li ser destên Erebên hawîrd li Cindirêsê hatibû kuştin, û şeş sal di ser dagîrkirina Efrînê re darbasbûn, Komela Hêvî ya Kurdên Sûriyê li Belcîka roja Duşemê 18 / 03 / 2024an, û bi beşdariya li dor sed kesayetiyên Kurd û dostên gelê Kurd, rawestandinek li bajarê Leuven a Belcîka lidar xist.**

# Avdar, Meha Kurdî

**Dilovanê Deştê**







Meha Avdarê, ew meha ku bûka salê ye, ew meha ku destpêka xweşî û xwenûkirina xweristê ye, bêhtir ji hemî mehên salê, bi xurtayî cihê xwe di bîrdanka neteweyî ya miletê Kurd de girtiye. Ew bûye nîşana nûjenkirina xwenaskirina miletê Kurd û nasnameya wî. Herwiha, Avdar xewn û hêviyên miletê Kurd û bobelat, karesat û bêhêvîbûnên wan, bûyer û bîranînên xweş û xemgîniyên wan hem li hev dicivênê hem jî xurtir dikê.

Belê, dema merov li nav rojên Avdarê, yeko-yeko, bigerê, rastiyek xwe rapêş dikê, û ew jî rastiya ku kêm roj di Avdarê de hene ku ne hilgirê hin bûyerên Kurdewarî, çi xweşî û şahî û çi kul, derd û êş bin. Ka em bi hev re rojên vê mehê li bêjingê bikin û hinekî ji dîroka xwe bibîr bênin.

1. Di 1ê Avdara sala 1979ê de, nemir Mela Mistefayê Berzanî, li nexweşxaneya George Town li Emerîka, koça dawî kir, û cendekê wî yê pak ber bi Îranê ve hate veguhestin, û li goristana gundê Şino bi axê hate spartin.

2. Di 2iyê vê mehê sala 1970yî de, Berzaniyê nemir Peymana Otonomî ji bo Kurdistanê, bi serkomarê Îraqê – Ehmed Hesen Bekir – re îmze kir. Ev peyman di 11ê Avdarê de hate ragihandinö û bi navê Peymana 11ê Avadarê hate naskirin.

3. Di 2iyê Avdarê de, Dadgeha sezakirinê ya Îraqê yekem civîna xwe ji bo vekolînên derbarê kuştina 8000 kesê Barzanî lidar xist.

4. Şoreşa Dêrsimê di 3iyê meheö sala 1937 de, û bi serkêşiya gorbihişt Seyid Riza, dest pê kir. Ev şoreş dijî rijîma Tirkiyê û hewldanên wê ji bo guhertineke demografî û tirkirina herêmên Kurdî pêk bênê bû. Ev raperîn/ şoreş mezintirîn yek bû piştî şoreşa Şêx Se›îdê Pîran. Hêjayî gotinê ye ku şoreşa Dêrsimê ji Avdara 1937 – 1939ê berdewam kir, û bi hezaran Elewî û Kurdên Zazî hatin kuştin.

5. Bumbebarankirina bajarê Silêmaniyê ji aliyê firokên Brîtaniyayê, û bi alîkariya hikûmeta Îraqê, di 4ê Avdara 1923 de bû. Ev bumbebarankirin ji bo têkbirina şoreşa Şêx Mehmûdê Hefîd bû.

6. Raperîna sala 1991ê li Kurdistanê, di 5ê Avdarê û bi jor de dest pê kir. Vê raperînê ji Silêmaniyê dest pê kir, û pişt re, hinohino li hemî deverên Başûrê Kurdistanê belav bû. Ji encamên vê raperînê yên girêdayî bi Başûrê Kurdistanê ve ev bûn:

a. Encûmena Ewlekariyê ya NY biryar bi qedexekirina firokên cengê raserî Bakûr û Başûrê Îraqê stand.

b. Başûrê Kurdistanê weke herêmeke federal di hindurê Îraqê de hate ragihandin.

7. Di 5ê Avdara 1992 de, cendekên herdu nemiran Mela Mistefayê Berzanî û yê pakrewan İdrîs ji Şino (Îran) ber bi herêma Kurdistanê ve hatin veguhestin, û li goristana Barzan bi axê hatin spartin.

8. Di 6ê Avdara sala 1975ê de, rijîmên îraqê û Îranê, û bi çavdêriya serokomarê Ceza›îrê, peymaneke rûreş û şermezar Îmze kirin ji bo girtina sînor û rawestandina hemî şêweyên alîkariyê ji ser Başûrê Kurdistanê.

9. Di 7ê Avdara sala 1925ê de, şoreşa Şêx S›îdê Pîran dest pê kir. Biryar pê hatibû standin ku di 21ê Avdarê de dest bi şoreşê bikin. Lê, di hin jêderan de jî tê gotin ku di 5ê Reşemeha sala 1925ê de, Şêx Se›îd û hijmarek ji hevalbendên xwe digihine gundê Pîran, ku dikevê Bakûrî Amedê; di heman demê de, hêzek ji cendirmeyên Tirk jî hatine ku hin Kurdên wî gundî desteser bikin. Li wir, û bêyî tu amadekarî berê jê re bûbin, ew roj bû destpêk. Hêjayî gotinê ye ku di encamên şer de, Şêx Se›îd û 47 hevalên xwe hatin girtin, û di 30e Gulana 1925ê de hatin bidarvekirin. Ev gotina gorbihişt Şêx Se›îd ya dawî bû: «Ev dawiya jiyana me ya normal e, û ez ne poşman im ku ez bibime qurban di ber berjewendiyên miletê xwe de. Em serbilind û kêfxweş in ku wê neviyên me hemberî dijminan ji xebata me şerm nekin.»

10. Di 7ê Avdara 1991ê de, artêşa rijîma Îraqê herêma Çûman topbaran kir.

11. Di 8ê Avdara sala 1921ê de, hin jêder dibêjin ku di 6ê Avdarê de bû, destpêka şoreşa Qoçgîrê (Koçgîrê) li herêma Dêrsimê bû.

12. Koça dawî ya hunermendê gorbihişt Mihemed Şêxo di 9ê Avdara 1989ê .....

6

# Li Holanda jî, di bîranîna Roja Rojnamegeriya Kurdî de, simînarek lidar ket

Li roja Yekşemê 21ê Nîsanê 2024an, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê û Partiya Welatparêzên Kurdistanê, bi boneya Rojnamegeriya Kurdî, bi hev re li Holenda, bajarê Erinhêmê simînerek lidar xistin. Du mamoste: Heyder Omer û Mihemed Qere Hesen, û van helbestvanan: Gulîstan Awaz, Baranê Cûmê, Îbrahîm Hewar kurdî, Ezîz Qere Hesen û Elî Hemo beşdar bûn, û simîner vejandin.

Dora 130 kesî beşdar bûn, û cemewerên beşdar xweşiya xwe ji simînerê diyar kirin.



**Avdar... Dûmahîk**

de bû.

13. Di 11ê vê mehê de ji sala 1974, rijîma Îraqê ji peymana sala 1970yî vegeriya û soz û peyman binpê kirin. Artêşa Îraqê bi hêzeke mezin êrîş bire ser herêma Kurdistanê. Di encama vê êrîşê de, şoreşa nemir Berzanî şikest.

14. Di 12ê Avdara sala 2004 de, serhildana Qamişlo bû ku bêhtir ji 33 ciwanên Kurd, di encamê de, jiyana xwe ji dest dan.

15. 12ê wê sala 1991ê, raperîna Kerkûkê ye, û Kerkûk ji rijîma Sedamê xwînxwer rizgar bû.

16. 14ê meha Avdarê sala 1903iyê, roja jidayîkbûna nemir Mela Mistefayê Berzanî ye.

17. 14ê mehê ji sala 1991, raperîna Duhokê û rizgarkirina bajêr û herêma wê ji nav destên kujerê devbixwîn Sedam.

18. 15ê wê di sala 1932iyê de, şoreşa Mela Mistafayê Berzanî dest pê kir.

19. Hersê rojên reş ku bi ser herêma Kurdistanê de hatin, 16, 17 û 18ê Avdara 1988, topbarankirina Helebçe, Xormal û Dicêlê bi çekên kîmawî, (xazên xerdel û siyanîdê).

20. Di 20ê wê di sala 2008 de, hersê xortên Kurd (hersê Mihemed) bi destê hêzên ewlekariyê yên rijîma Be›es li Qamişlo şehîd ketin û 6 kes jî birîndar bûn.

21. Di 20ê Avdara sala 2015ê de, û bi destê Rêxistina Da›işê ya terorist, bêhtir ji 52 kesan hatin kuştin û bi dehan jî, di encama 2 teqînan de, hatin birîndarkirin.

22. 21ê Avdarê cejina neteweyî ya Newroz e. Ev roj Sersala Kurdî ye ku, ji 612BZ ve û ta roja îro, kêf û şahî û aheng di vê rojê de têne lidarxistin. Newroz nîşana azadiyê ye.

23. Di 21ê Avdarê de, roja Newrozê, sala 1982iyê, endamê komîta navendî ya Partiya Karkerên Kutrdistan Mezlûm Doxan, û bi banga xwe ye navdar «Berxwedan Jiyan e» ku ta îro jî bûye slogana xebat û berxwedanê, laşê xwe yê pîroz kire êzing ji agirê Newrozê re. Belê, wî di zîndanê de, agir berda bejina xwe da ku ew jî, weke Newrozê, bibê nîşana azadiyê.

24. Di vê roja pîroz de, di sala 1986ê de, gorbihişt Silêman Adê di xwepêşandaneke dijî zor û setema rijîma Be›is, li bajarê Şamê, û bi gulebarankirina ji aliyê artêşa leşkerî û hêzên ewlekarî ve, canê xwe ye pîroz sparte Afirênerê Gewre. Pakrewan Silêman jî bû nîşana vîna Kurdan li her deverê.

25. Di 23iyê Avdara 2002 de, helbestvanê Kurd yê payebilind Seydayê Tîrêj çû ber dilovaniya Yezdanê Pak û Gewre.

26. Di 24ê Avdara sala 1914ê de, gorbihişt Şêx Mehmûdê Hefîd, tevî şoreşgerên pê re, û ji bo xweparastina ji destê dijmin, ji Silêmaniyê derketin û berê xwe dane şkeftên derveyî Silêmaniyê. Şêx Mehmûd di 23iyê Gulana sala 1919ê de, dest bi serhildanê dijî Îngilîzan dikê; û di 31ê Rezbera sala 1922iyê de, bi navê «Hikûmeta Kurdistanê», Kurdistana serbixwe radigihênê, û xwe weke qiralê vê dewletê didê nasîn. Di 9ê Cotmeha sala 1956ê de, Şêx Mehmûdê Hefîd diçê ber dilovaniya Xwedê.

27. Di 24ê Avdara sala 1924ê de, Şêx Evdilqadir kurê Şêx Ubeydulahê Nehrî, digel hevalên xwe, li bajarê Amedê hatine bidarvekirin.

28. Di 28ê Avdara sala 1986ê de, endamê Komîteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistan PKK şoreşgerê Kurd û pakrewanê bi navûdeng Me›esûm Qurqmaz li ser çiyayê Gabara li devera Şernexê şehîd ket. Gorbihişt Qurqmaz bû yê ku pêşemîn gule dijî mêtinkarên Tirk teqand.

29. Serhildana Amedê di 28ê Avdara sala 2006ê de dest pê kir; di encama vê raperînê de, 14 kesên Kurd, ji wan 7 zarok bûn, şehîd ketin, û bêhtir ji 200 kesî jî hatin girtin.

30. 31ê Avdara sala 1947, dîsa rûreşiya koledar û mêtinkeran derbarê miletê Kurd tê xuyakirin. Di vê rojê de, û piştî têkçûna «Komara Mehabadê», Qazî Mihemed û çend hevalên xwe têne bidarvekirin.

Ev hin bûyer û boneyên ku di jiyana miletê Kurd de pir bi navûdeng in. Belê, dîroka miletê Kurd wiha ye. Dîroka miletê Kurd hin roj û demên xweş, lê gelek yên nexweş jî di nava xwe de vedihewînê.

# Ahengên Cejna NEWROZê- 2636.K li derveyî welêt

## Li Holendayê



Bi beşdariya jimareke mezin ji revenda kurdî li Holendayê û beşdariya gurzek ji hunermendên Kurd û koma Mîdya ya Folklorê Kurdî, Rêxistina Holendayê ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê şahiyek navendî di roja pêncşemê 21.03.2024 an li bajarê Lêlîstadê lidar xist.

Şahî bi xêrhatina beşdaran, pîrozbahî li wan û rawestandina bêhnek bêdengî ji bo giyanê pakrewanên Newrozê ku wêneyên wan di yek tabloyê de li hola şahiyê hatibûn komkirin, dest pê kir.

Hunermendên Kurd piştî xwendina sirûda netewî ya Kurdistanê dest bi stiranan kirin û cemawer xelekên dîlanên folklorî girêdan.

Gotinek bi navê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê ji aliyê birêz Xandî Berzencî ve hate xwendin.

Di gotinê de li ser giringiya pîrozkirina Newrozê hate tekezkirin. Herwiha, li ser qurbaniyên ji bo Newrozê hatine dayîn hate rawestandin.

Li ser pêwîstiya civaka kurd li welatên dîyasporayê, giringiya piştgiriya gelê me li hundir, di riya hebûn û beşdariya revenda kurdî di çalakiyan de, wek nimûneyek xwepêşindanan, ji bo em beşek ji êş û azarên gelê xwe li hundirê welêt hilgirin, û wêneyê wê êşê bigihînin navendên biryardar ên li Ewropayê, yan jî binpêkirinên berdewam ên li dijî gelê me yên li Rojavayê Kurdistanê û bi taybetî li herêmên ji aliyê Turkiyê ve hatine dagirkirin, şermezar bikin. Herwiha, di axaftinê de bal kişande ser girîngiya parastina ziman û çanda Kurdî.

## Li Hanoverê



Di 21.03.2024an de, li ser vexwendina şaxa Hannover a Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ahenga Newrozê hate lidarxistin, Aheng bi xuleke bê deng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê, di ber sirûda Ey Reqîb re, dest pê kir.

Gotinên hatine xwendin jî ev bûn:

1- Şaxa Hannover a PYDKs (YEKÎTÎ) Ferhad Elûş.

2- PYDKS Reşîd Şe›eban.

3- Gotina Jinê bi zimanê Erebî Zelûx Horo.

Li ber reqs, stran û dîlana Kurdî û reqsên koma Zozan û koma Zîlan hate bidawî kirin.

## Li Birîmenê



Di 21.03.2024an de, li ser vexwendina şaxa Bremen a Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) ahenga Newrozê li Hola Stariye hate li darxistin. Aheng bi xuleke bê deng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê di ber sirûda Ey Reqîb re destpêkir

gotinên hatine gotin ev bûn:

1- PYDKS «Ehmed Zîbar».

2- Hevkariya Kurdên li Bremen «Bavê Aras».

3- Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Ewrupayê «Ronî Stêrk»

4- Komeleya Newroz «Ciwan»

Bi beşdarbûna gelek hunermendên Kurd û Kurdistanî

Li ber reqs, stran û dîlana kurdî û reqsên koma Zozan hate bidawîkirin.

## Li Bonê



Di 21.03.2024an de, li ser vexwendina şaxa Bonnê a Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, ahenga Newrozê xweş û bi aştiyane li ber saz û stranên kurdî li siruştê hate lidarxistin û beşdaran Newroz li hev pîroz kirin.

## Li Hamburgê



Li ser vexwendina Komela Newroz, ahenga Newrozê li bajarê Hamburg li Almaniya hat lidarxistin. Aheng bi xuleke bêdeng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê û yê cejina Newrozê di gel sirûda Ey Reqîb dest pê kir.

Gotina Komelê hat xwendin û tê de kar û armanca komelê hate xûyakirin, pişt re bi stran û dîlanên kurdî berdewam kirin; tê de xelat li zarokan belav bûn. Li dawiyê spasiya beşdaran hate kirin û cejina Newrozê hate pîrozkirin.

## Li Birêtaniyayê

Revenda Kurd li Birêtaniyayê ahenga Newrozê bi xulek bêdeng li ser giyanê hemû şehîdên Kurd û Kurdistanê û bi taybet şehîdê Newroza1986an Silêman Adê li Şamê rawestiyan, û malbata nemir xelat kirin; piştre aheng li ber reqs û stranan dest pê kir û Newroz hate pîrozkirin.

## Li Zansberga Almanyayê



Di 22.03.2024an de, li ser vexwendina komeleya Zansbergê ahanga Newrozê bi xuleke bê deng dest pê kir bi beşdarbûna hejmareke baş ji Kurdên li wir dimînin, û li ber reqs û stranên neteweyî û evînî dîlan hatin gerandin û cejna Newrozê hate pîrozkirin.

## Li Berlînê



Di 24.03.2024an de, şaxa Berlînê ya PYDKs «YEKÎTÎ», ahengeke cemewarî mezin bi boneya cejna Newrozê îsal li Berlînê lidar xist, gelek nûnerên partiyên Kurd û Kurdistanî jî lê beşdar bûn wek:

1- Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanî.

2- Partiya Demoqrat a Kurdistanî «Îran»

3- Nûnertiya nivîsgeha Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilata Sûriyê.

Û hejmarek ji dost û kesayetên Alman û kesûkarên Kurd li Berlînê.

Destpêkê xuleke bê deng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê hate rawestandin û pişt re, bi beşdarbûna gelek hunermendên Kurd û Kurdistanî Newroz hate geşkirin.

Gotina Partiya Yekîtî Demokrat Kurd li Sûriyê «YEKÎTÎ»

..... 8

## Li Hesekê Ahenga Rojnamegeriyê Lidar Ket

Roja Înê, 19.04.2024-an, Rêxistinên Hesekê û Serê Kaniyê yên PYDKS, li nav siruşta buhara çiyayê Kezwanan (Ebdilezîz) bi boneya Roja Rojnamegeriya Kurdî, ahengeke balkêş lidar xistin, bi sedan kes lê



beşdar bûn.

Birêz Mihyedîn Şêx Alî, derbarê Rojnameya Kurdistan û rêl û kelemên li pêş derçûna wê hatine danîn axivî, û çawa paşê di siha qedexekirina zimanê Kurdî de, li ser wê şopa pîroz, gelek kovar hatine weşandin.

Pişt re, li ser navê Kovara EL HÎWAR, mamoste Selman Barûdo bi zimanê Erebî gotinek pêşkêş kir, û mamoste Rona Elî, Nameya



Kovara PIRS û Weşana NEWROZ a bi zimanê Kurdî ji beşdaran re xwend.

Aheng bi hin stranên Folklorî û Şanoyekê bi dawî hat.

## Hevdîtinek bi Partiya PWK re

**Li ser vexwendina Partiya Welatparêzên Kurdistanê, şandeke partiya me, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ji van hevalan pêk dihat: Xandî Berzencî, Nîzamedîn Qere Hesen û Elî Mem, roja Yekşemê 24.3.2024an, li Holendayê bi şandeke ji partiya PWK ji van birêzan pêk dihat: Ferhad Boskan, Qedrî Erol, Hevdîtinek kirin.**

**Vexwendname ji bo danasîna partiya nû ya ku di encama yekkirina refên Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) û Tevgera Demokratîk a Kurdistanê (TDK–TEVGER) di Kongira ku di meha Êlûna 2023yan de, li bajarê Amedê hate girêdan.**

**Şanda PWK dest bi danasîna partiya nû, giringiya yekxistina rêzên herdû partiyan û armancên ku partiya nû dixwaze pêk bîne, kir.**

**Herwiha, li ser pirsgirêk û astengiyên ku hikûmeta Turkiyê di riya têkoşîna partiyên Kurdistanê derdixe de axivî.**

**Ji aliyê xwe ve, şanda partiya me pîrozbahiya partiya PWK kir û hêviya serkeftinê di têkoşîna wan de xwest; herwiha jî li ser rewşa siyasî ya Rojavayê Kurdistanê, rewşa tevgera kurdî, rola partiya me, cihê wê û helwestên wê ji Partiyên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê û Partiyên Kurdistanê bi gelemperî axivî.**

**Ji aliyekî din ve, li ser binpêkirinên çekdarên bi ser Turkiyê ve, yên li herêmên dagirkirî (Efrîn, Serê Kaniyê û Grê Spî) bi ferehî rawestiya .**

**Di dawiya hevdîtinê de, herdu alî li ser lidarxistina çalakiyên hevbeş li Holendayê, pevguhertina weşanan û lidarxistina civînan her demekê li hev kirin.**

### Ahengên... Dûmahîk

serkirdeyê partiyê birêz Elî Kemal pêşkêş kir, tê de xûya kir ku Newroz cejna hezkirin, aştî, azadî û wekheviyê ye; giringiya ahenga Newrozê û piştî ewqas qurbanî û berdewamiya vêxistina agirê Newrozê tevî ku dijmin bi hemû şêweyan dixwest û dixweze vemrîne. Li dawiyê Newroz bi kêfxweşî bidawî bû û hate pîroz kirin..

### Li Denîmarkê

Li dîroka 23.03.2024an, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, şahiya Newrozê li bajarê Hembên, girava Yolend lidar xist. Bi beşdariya cemewerekî pir, şahiyê bi xwendina Ey Reqîb û bîranîna pakrewanên Kurd û Kurdistanê bi taybet pakrewanê Newrozê Sliyman Mihemed Adî û pakrewanên li Cindirêsê, dest bi şahiyê kir.

Giropek ji hunermendên Kurd (Dilo Doxan, welat xweş, Şiyar û dijwar) şahî germ kirin û vejandin.

### Li Leuvinê -Belçîke

Li roja Çarşemê, 20ê Avdarê li bajarê Leuvinê Komela Hêvî ya Kurdên Sûriyê li Belcîka çalakîya şeva agirdadanê ji bo Newrozê lidar xist.

Li kat 17.30, ji navenda bajêr, bi sedan Kurd û hevalên gelê Kurd meşek di nav bajêr re birêve birin ta cihê şahî û agirdadanê. Li 18.30, li meydana Martelarplenê, li hember stesûna tirênê, agirê Newrozê hate dadan, û ahengeke bi coş û stran û awazên Newrozê û yên li ser babeta azadîyê, bi dengên gelek hinermendan hatin xwendin, û Koma Zozan ya Holenda jî çend listikên folklorî pêşkêş kirin.

Di navber movikên programa va çalakîya hunerî de gotinên dostên gelê kurd , û ya Partîya Yekîtî a Demoqrat a Kurd , û ya rêvebirê Inistîtuya Kurd ya Brukslê , ya Partîya Sosiyalîst a Kurdistanê jî hatin xwendin.

Hinermendên beşdar ev bûn :

Koma Zozan ya Dîlanê ( Holende )

Yûsêf Reşo , Fehd

Cîhan Can

Zekerî û Hemdo

Kom mûzîkê : Mehemed Cemîl , Mehemed Qaqo , Seman Efrînî .

Hêjayî gotinê ye ku bêtirî 500 kes çalak bûn , bi hezaran jî kesên di ber cihê ahengê re derbasdibûn agahdarbûn ko cejneke Kurdan heyev,û Kurd her sal cejna xwe di vê rojê vedijîn .

### Li Rotselaar -Belçîke

Bo boneya Cejna Newrozê roja Înê 22 / 03 / 2024 an



Partîya Yekîtî a Demoqrat a Kurd li bajare Rotselaar şeveke hinerî li darxist .

Hinermendên beşdarî şevê bûn (Osman Can , Imad Kakilo , fehîme , Yûsif Reşo û tembûrvan Romaf û orgvan Xelîl Ukaş ).

Di destpêka Şevê de xêrhatina mêvanan hate kirin , û sirûda Ey Reqîb , û deqeke bêdeng ji bo gîyanên Şehîd û pakrewanên Kud û Kurdistanê hate sekinîn , piştre gotina Partîya Yekîtî a Demoqrat a Kurd hate xwendin spasîya henermend û mêvanên şevê hate kirin û aheng û dîlanê bi srtan û awazên Newrozê ta dawîya şevê bi rêve çû.

Mêvanên beşdarî şevê bûn dora 200 kes bûn .

# Ahenga Roja Rojnamegeriya Kurdî Li Qamişlo

Roja Duşemê, 22yê Nîsanê, bi beşdariya birek rewşenbîr, nivîskar û xemxurên ziman û wêjeya Kurdî, li ser daxwaza Komîta Çand û Ragihandinê Ya Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), salvegera 126-emîn a Roja Rojnamegeriya Kurdî hate pîrozkirin.

Di ahengê de, gotina Kovara PIRS û weşana NEWROZ hate xwendin, paşê nivîskarê Kurd Berzo Mehmûd li ser hin mijarên zimanî axivî û nerînên xwe ji beşdaran re derbirîn. Paşê nivîskar Konê Reş jî li ser hin qonaxên rojnameya Kurdistan axivî. Pişt re, Newafê Bişar li ser kurtejiyan û xebata wêjeyî ya Berzo Mehmûd nivîsek ji beşdaran re xwend, û weke endamên komîta»Kemal Henan» Berzo Mehmûd ji bo wergirtina vê xelatê destnîşan kirine, û li dawiya ahengê, xelat radestî Berzo Mehmûd kirin.

Ev ye deqa Nameya Kovara PIRS û Weşana NEWROZ e:

**Roja Rojnamegeriya Kurdî Cejneke pîroz e!**

**Nameya Weşana NEWROZ û Kovara PIRS**



Berî 126 salan, li roja 22yê Nîsana 1898-an, yekemîn car di dîroka gelê Kurd de, li ser destê Mîrê nemir, Miqdad Midhet Bedir-Xan, rojnameyeke xurû bi zimanê



Kurdî û tîpên Erebî bi navê «KURDISTAN» li Qahîre, Çapxaneya El-Hîlal hatiye çapkirin û belavkirin. Di nav gelên cîhanê de, Kurd jî bûne xwedî rojname.

Mîrê gewre Miqdad Midhet Bedir-Xan 5 hejmar ji rojnameya xwe ya duheftane weşandine, û her car 2000 hejmar bê pere rêkirine welêt da ku Kurd wê bixwînin, fêrî zanist û hunerê bibin. Lê, bi armanca ku her Kurd çavgirtî bimînin, mafên xwe nas nekin, dost û neyarên xwe ji hev cuda nekin û her di bin destên biyaniyan de dîl û bê vîn, perîşan û hejar bimînin, xêrnexwaz û neyarên wan, di serê Xankar Ebdul-Hemîd de xwendine ku ew rê li ber vê rojnameyê bigre, û nehêle ew ronahiya zanînê di nav Kurdan de belav bike. Xankarê sitemkar jî fermana qedexekirina «Kurdistan»ê derdixîne, derçûna wê qedexe dike.

Piştî Mîr Miqdad, birayê wî Mîr Ebdurehman Bedir-Xan, di merc û hoyên pir dijwar de, li cihên dûrî welêt, ji derveyî sînorên dewleta Osmanî (London, Cinêv, Folkiston…) wê xebatê dişopîne, û 31 hejmar jê tênê weşandine, ku li roja 14.04.1902yan, hejmara dawî ji vê rojnameya nirxdar çap û belav bûye, yekcar ji ber çavên xwendevanên xwe winda bûye!

Lê, wekî her car, gelê Kurd bê westan li ber xwe daye, zana û mezinên wî dane ser şopa nemir Mîr Miqdad û Mîr Ebdurehman Bedir-Xan, û bi saya Mîr Celadet Bedir-Xan, Kamîran Bedir-Xan û hevalên wan ên dilsoz, kovara Hawar, Ronahî, û Roja Nû, bi zimanê Kurdî û tîpên Kurdî latînî, weşandine, ku bi derçûna wan, dilê gel şa bûye. Nivîskar, helbestvan, zana û xebatkarên Kurd ên mezin mîna Cegerxwîn, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Qedrî Can, Mele Ehmedê Namî, Reşîdê Kurd, Hesen Hişyar … HWD, bi berhemên xwe yên şêrîn, rûpelên wan xemilandine, li ser welat, ziman, folklor, dîrok û wêjeya Kurdî ya kevin kûr û dirêj nivîsandine.

Di van 50 salên dawiyê de, hin kovarên Kurdî mîna Gulistan, Gelawêj, Xunav, Pirs û Newroz…HWD, li ser wê rêya pîroz birêve çûne, li gora karîn û derfetên berdest folklor û zimanê Kurdî parastine û pêşve birine.

Digel hemû reng û cûreyên qedexekirina zimanê Kurdî li Sûriyê, îro zimanê me pêşve diçe û li ser asta cîhanê pileya 8-emîn wergirtiye, bi milyonan keç û lawên Kurd rabûne ser piyan, li zimanê dayikê xwedî derketine, li dibistan û zanîngehan fêr dibin, pê dixwînin û dinivîsin, bi sedan kovar, pirtûk û rojname tênê çapkirin, û bi



sedan pêlweş, televizyon û navendên ragihandinê bi zimanê Kurdî weşanê dikin. Dema ku berê zimanê me li pêş be, tê wê wateyê ku berê gelê me û doza wî jî li pêş e, û em geşbîn in dê rojek were, gelê me jî yekîtiya xwe saz bike, û mafên xwe bidestxîne. Em gotina Ebdurehman Bedir-Xan a di hejmara 7an a KURDISTANê de, berî 126 salan belav kiriye, bi balkêşî guhdar bikin:

«…*Wekî em niho ve hişê xwe bînin serê xwe, neyariyê, bêtifaqiyê nekin, wek bira hij hevdu bikin. Kes kesî nekujit, kes malê kesî talan nekit, agirê fitne û fesadê bitemirînin. Çiqa Kurmanc hene, wê li dinê û axretê rahet û serfiraz bibin, qedir û i›tibara wan jî gelik zêde bibit. Wekî Kurda ev hal ji xwe re girt tu cara feqîr nabitin, wê dewlemend bibin, dinya û axreta wan ê zêdetir me›mûr bibe.*»

Li dawiyê, di vê bîranîna giranbuha de, bi navê Kovara PIRS û Weşana NEWROZ, bi gurzek gul û nêrgizên welêt em damezirênerê rojnameya «Kurdistan» Miqdad Midhet Bedir-Xan bibîr tînin, û vê cejinê li hemû nivîskar, rewşenbîr û xemxurên ziman û wêjeya Kurdî pîroz dikin.

Roja Rojnamegeriya Kurdî li gelê Kurd pîroz be!.

18.04.2024 Z- 2636 K

**Kovara PIRS û Weşana NEWROZ**

# Nanxo

Memê Alan

Peyveke hevdudanî ye, yanê ji du gotinên xwerû pêkhatî ye («Nan» + «Xo»), û xwedî wateyeke nirxbuha ye, bi taybetî jî li ba bavpîrên me Kurdan (ên ku qedra nanxoyê dizanîn û digirtin), ta radeya ku dema du kesan nan û xoyê hev dixwarin, ew nanxwardin dibû girêbesteke biratiyê di navbera herdiwan de. Vêca di talîtî, şîrînî, xemgînî û şahiyan de, li kêlek hev diman, û ew dilsozî bi wan re dima û heta-hetayê diçû. Ne wek çerxedema me ya îroyîn ku hemî perensîp û sincên nirxbuha pir lawaz bûne, û jiyana mirovan tev ketiye peran û berjewendiyên kesayetî, ta asta ku hemî têkiliyan bi wê dilbirê dipîvin.

Di pêvajoya van ton sincên pîroz de, ezê vê kurteçîroka kevnar a kelepûrî ji xwendevanên Newrozê û hemî kesên hîn van sincên nirxbuha û pîroz rêz digrin û diparêzin re, pêşkêş bikim.

Dibên rojekê mirovekî Kurd î perîşan li bajarekî ji bajarên Kurdistanê, tevî dê, bav û xwîşka xwe dijiya, lê ew mirov xwediyê perenîp û sincên nirxbuha, û bîr û bûçûnan bû. Ew, ji ber perîşanî û belengaziya malbatê, neçar bû ku berê xwe bide bajarekî din e Kurdistanî, ji bo ji xwe û malbata xwe re pariyê nên peyda bike. Lê, piştî ku giha wî bajarî û ji xwe re xebitî, heroj nanek dikirî û diçû binê qonaxeke/qonaqeke wî bajarî, nîvê nanê xwe dixwar û nîvê din jî li şûn xwe dihîşt. Dibên di wê karnavê de, xwediyê qesrê heroj li wî temaşe dikir, li wî şêtûmêt dima, û ji xwe dipirsî: Gelo, çima ev mirov weha dike?

Rojekê xwediyê qonaxê dageriya cem wî mirovî û pirsa ku jê re bûye heyr jê kir. Wê hîngê mirovê belengaz weha bersiv da û got: Bira, ez perçê din ji nên dihêlim, bi hêviya ku kesekî bi «nanûxwê» were bi min re parve bike û bibe birayê min ê dinyê û axretê. Wê hîngê mirovê dewlemend destûr jê xwest ku ew vê re xwarinê parve bike, wî jî bi fermobûn erê kir, û weha bi dilsozî biratiya hevdu pejirandin. Dibên xwedanê qesrê jî dotmamek wî e sêwî hebû, li ba wî dijiya û wî hez dikir ku ji xwe re bike hevjîn. Rojekê kesê dewlemend dostê xwe vexwende mal, da ku bi hev re xwarinekê bixwin; dema ku sifre hate danîn û çavê mîvên li dotmama wî ket, dil hebandê, û weha ji pismamê keçkê re got: Dilê min di dotmama te de heye ku ez ji xwe re bikim hevjîn, bi heqê «nanxoyê» di navbera min û te de, hêvîdar im tu erê bikî. Dostê dilsoz rê nedî ku bêje na. Vêca, piştî şêwirdanê bi dotmama xwe re, pêle dilê xwe kir û soz dayê. Piştî ew zewicîn, xatirê xwe xwest û bi hin alîkariyên dostê xwe vegeriya cem dê û bavê xwe. Dibêjin demek dirêj derbas bû, mirovê dewlemend malnûmewdanê xwe tev wenda kir û perîşan bû, rê û olaq li ber hatin girtin, vêca neçar bû ku berê xwe bide bajarê dostê xwe, da ku bi



alîkariya dostê xwe çarakê ji rewşa xwe ya ne baş re bibîne. Pirs li pey pirsê, piştî çend rojan gihîşte ber malê, dît ku di wê karnavê de hevalê wî dewlemend bûye û bûye xwedan qesir û qonax. Wî xwe bi dergehvanê qesrê da naskirin, û piştre rêdana hevdîtina destbirayê xwe xwest; lê dergevan jê re got ka li vir be ta ku ez ezbeniyê xwe bi hatina te agahdar dikim. Piştî kurtedemekê dergevan vegeriya û di destan de tûrek hebû. Wî ew tûr da dest û got: Ezbeniyê min nikane te bibîne, lê wî ev tûrê peran ji te re rêkir. Wê hîngê mirovê bêçare şêt ma û pir xeyidî, û got: Ka ew sinc û perensîpên te pê bang dikir? Ka nanxoya di navbera me de? Ka dostaniya bi dilsozî? Wî tûrê peran avêt û got: Ez ne mihtacê perên te me jî, ji qesrê derket û bi zikak û kolanan ket. Ha li vir ha li wir, roj bi tengasî û zehmetî derbas bûn, ta ku rojekê rastî kalemêrekî rihsipî hat. Kalemêr jê pirsî: Çi bi serê te hatiye kurê min, çima ewqas bi ser xwe de diponijî? Tu ji kû yî? Wî rabû çîroka xwe tev ji kalemêr re got. Kalemêr jê re got: Kurê min, ez bi serpêhatiya te pir xemgîn im, te mirovekî aşne, zîrek, dilsoz û emîndar dibînim, û pêşinyar dikim ku tu li ba min bixebitî û karûbarên min bi rê ve bibî, çimkî ez mirovekî maldar im û tu kesî min tune ye! Ka tu çi dibêjî, lawê min?

Ew razî dibe û vê re dere malê, û li ba wî dixebite. Çend salek derbas dibin ew dewlemend dibe, û dibe xwedan qesir û qonaq jî. Wê hîngê Jineke navsale li deriyê qesra wî dixe, û jê dixwaze ku li cem xizmeta wî û qesrê bike, û jê re wek dayik be. Ew razî dibe, û weha kurtedemek dibore, ta rojek tê pîrejin jê re dibêje: Lawê min! weha jiyana te ya tenêtî naqede, divê ez hevjîneke ji te re wînim û tu bizewicî. Ew pêşinyara dapîra xwe dipejirîne. Pîrej›nê keçeke bedew û resen jê re dibîne. Haziriya dewatê tê kirin; lê, li roja şahiyê û def û dîlanê, û bi hatina mazûvanan re, ji nişka ve, çavên wî li destûbirayê xwe, xwediyê nanxoyê, dikeve ku ew jî beşdarî şahiyê dibe. Ew radibe bi rûyê dostê xwe de dipijiqe û diqîre, û jê re dibêje: Tu li vê derê çi dikî, ey bê nanxoyo? Hevalê wî yê dilsoz wî dihedîne û dibêje: Xwe ragire ta ku tu rastiya tiştê bûyî nas bikî. Ew jê re çîrokê ji roja ku hatiye ber deriyê qesrê hewal dide, û dibêje: Bira! Ya yekê: Tu zanî wexta tu hatî, min di devê pencerê re li te temaşe/sêr dikir, û min rewşa te ya ne baş jî dît; vêca min nexwest te yekser bibînim, loma min tûrê peran ji te re

..... 11

# Giringiya navgînên hînkirinê

**Nûşîn Bêcirmanî**

***(Dîtina çavan, qinyata dila ye) serpêhatiyeke Kurdî...***

Navgînên hînkirinê, hêmanin bingehîn in ji hêmanên pêvajoya perwerdeyî, gihaye radeya ku bêyî wan, hînkirin, weke tê xwestin, nikare bi karê xwe rabê. Lêkolînên perwerdeyî isbat kirine ku herdema teknîkên perwerdehiyê yên baştir werin bijartin û bi şêwazekî zanistî û saxlem werin bikaranîn, ev yek dibe alîkar bo pêşveçûna pêvajoya perwerdeyê bi rengekî erênî.

Navgînên hînkirinê kevin in, IBIN XELDÛN di (DESTPÊK)a xwe de, tekezî li ser bikaranîna nimûneyên zindî di pêvajoya hînkirinê de kiriye, û ew dîtine baştirîn navgînên hînkirinê bo hêsankirina têgihiştin û wergirtina ezmûnan. Herweha IBIN SÎNA û ERRAZÎ jî, pêwîstî dane rola navgînên hînkirinê di pêvajoya hînkirin û hînbûnê de.

Berî em mijara navgînên hînkirinê şirovebikin, pêwîst e em zanibin navgîna hînkirinê çi ye? Bêguman gelek danasîn ji navgîna hînkirinê re hatine danîn, tev jî (navgînê) bi rengekî didin nasîn, û tev jî di erka navgînê de, ku pêşketina hînkirinê ye, dibin yek. Loma jî em dikarin bi vî rengî bidin nasîn:

**Navgîna hînkirinê**: (Her tiştê ku mamoste wê bikar tîne bo bi alîkariya wê, pêvajoya hînkirin û hînbûnê baştir bibe).

Navgînên hînkirinê bi xwe gelek cûre ne, li gorî babeta waneyê, an li gor temenê şagirt, bi giştî ev in:

1- Navgînên dengî: Radyoya hînkirinê, tomarên dengî.

2- Navgînên dîtbariyê: weke depreş, pirtûk, wêne û tişt.

3- Navgînên dengî û dîtbariyê: Radyoya hînkirinê, filmê hînkirinê...


4- Pêşengeh û seredan.

**- Sûdeyên navgînên hînkirinê:**

Ev çend sûdeyên navgînên hînkirinê ne, lê bêguman wê bihtir ji wan jî hebin.

1- Dem û westana ku mamoste û şagirt terxan dikin, kêm dikê.

2- Bala xwendekaran û guhdana wan bilind dikê, û agadariyan bi hêsanî



piştrast dike.

3- Pêvajoya hînkirinê li nik mamoste û şagirtan, hêsan dikê.

4- Derfetên hevpişkî û hevkariyê di navbera şagirtan de zêde dikê.

5- Ji bo têgihiştina hestî bingihekê peyda dikê û ezmûnên rastîn ji wan re peyda dikin ku şagirt berê bidin. xwe-çalakbûnê ve.

6- Ew, bo demeke dirêjtir, ezmûna perwedehiyê ji xwendekaran re zindî dihêle.

**- Mercên ku gerek di navgîna hînkirinê de peyda bibin:**

1- Gerek e navgîn li gorî babet û armancên waneyê bê.

2- Gerek navgîn saxlem bê, ne xirabe bê.

3- Gerek li gorî dema waneyê bê.

4- Gerek hêsan bê û pirsgirêk tê de nebin.

5- Divê navgîn bala şagirt bikişîne.

Di şirovekirina waneyê de bi alîkariya navgînên hînkirin û hînbûnê de, gereke mamoste hay ji van xalên jêrîn hebe:

1- Navgîn, gerek di dem û cihê guncaw de pêşkêş bikê.

2- Berî mamoeste navgînê bikar bîne, gerek wê bide nasîn û ka ji bo çi bikar tê.

3- Pirsên ku bala şagirtan dikşînin, ji wan bike, da ku ew li bersivê bigerin.

4- Piştî bikaranîna navgînê bidawî bû, gerek mamoste wê navgînê rake, bo şagirt pê ve girêdayî nemîne û bala xwe bidê beşê mayî ji waneyê.

Bêguman babetên perwerdeyê, çendî mirov li ser wan binivîse dê kêm be, lê di vê mijarê de ez dibêjim bikaranîna navgînên hînkirin û hînbûnê, bi awayekî vejîn, dê alîkariyê bide çareserkirina gelek pirsgirêkan di pêvajoya hînkirin û hînbûnê de.

***Bikaranîna navgînên hînkirinê, huner û zanîn e...***

---

**Nanxo ... Dûmahîk**

**şand da ku tu xwe amede bikî, berî ku dotmama te di wê rewşa perîşan de te bibîne? Ya diwem: Tu zanî kalemêrê ku hate ba te û tu niha vê re dixebitî bavê min e? Ya siyem: Tu zanî pîrejina ku xizmeta te û qesrê dike û te ji xwe re weke law dibîne diya min e? Ya çarem jî: Tu zanî ew keça ku tu dê niha vê re bizewicî jî xwîşka min e? Dibêjin wê hîngê ji nû ve bi germahî xwe avêtin hembêza hevdu, dilsoziya xwe bi hevdu re hîn pihêt û mekin kirin, û gotin: Rast e «nanxo» dilosozbûn û biratî ye.**

**Di dawiyê de, nirx, sinc û perensîpên bav û bavpîrên me hene, pir buha û hêja ne, û nayêne pîvan bi peran û derheman! Pêwîst e em pê pêgir û pabend bin û dev jê bernedin, xwîşk û birano!**

# Hejîra Pita Min

Mihemed Qere Hesen



Pita min jinek jinebî bû, digotin mêrê wê di zindanê de miribû, û li ser koma sêwiyan rûniştibû. Bi şev û roj li karê çolê bû, ji mêrekî pirtir karê zoromizê dikir, him jin, dayîk û bav, him jî mêrê malê bû, bes simêlên badayî jê kêm bûn. Gava ji kar vedigeriya dest, pî û lingan vê re deng dikirin. Hin caran jê re digotin mêrê bê simbêl, zend û bend badayî.

Di rex wî navî re karê pîrejiniyê jî dikir, her jina ji gund ku gav qiçikê xwe bibe diçûn pê wê û dibû pîrik. Li ba wan jinan dima ta zarokên xwe dibûn û bi dil vehesî û bê diyariya bûndinê li mal vedigerî. Dayîkên zarokên xwe nû bûne dikirin, ku berî ji çêlê zarokên xwe bi derkevin, diçûn ba wê ku tiştekî diyarî wê bikin, destmal an qalibek sabûnê an jî weqîk didu hene jê re dibirin.


Gava qalibê sabûnê jê re diyarî bihata wê jî diyar xocê gund dikir û jê re digot: Ev diyariya bûna zarokê filan kesî ye, û kî ji gund bimirê tu yê bi vê sabûnê lêşê wî bişoyî, belkî jiyana wî borandî jî were şuştin, ku pak û temîzê her gora xwe û wiha jî li ber xwediyê bisekine û derbas bihişta wî bibe. Lê gava diyariya xwe destmal be, ew diyarî mala xwedê dikir, ku nimêjvan pê destên xwe ziya bikin û gemar û teniya li wan girtî jê pak bikin, bi dilekî weke camê zelal û tijî bawerî bi xwedê û rindiyê, ku dilovaniya sipî ji dev û dilê wan bibare, bibe şan û ala bihiştê. Û gava diyariya xwe Hine be, di rojên zemewendên keç û xortên gund de dibir, pê şahiya rojên wan hine dikir. Tevî ku por li seriyê wê bûbû hiriya sipî. Ger hinan ji cînarên wê jê re bigotana: Çima bi wê Hinê tu pê porê xwe hene nakî ?

Wê dibersvand: Divê merov bi dayîna xwedê nelîze, wî ew li yaqî min diye, û serîsipîbûn şana çiyayê bilinde.

Ji ber rewişt û taybetên wê nav lêkiribûn Pitê. Ji ber weke dayîkek ji hemî zarok û ciwanên gund re bû, destê xwe li pişta wan xistibû ta ku hulima yekê ji jiyanê bikişîne, yanê destûra jiyanê dabû wan.

Gava pitê zarokên xwe bi firê xistin, di ber mezinkirina wan re darek hêjîrê li ber pozê maxê çandibû, çavekî xwe li darê bû, dewarê cîrana nekevin ênkûr û serê hêjîra wê nexwin. Lê qiçkên wê berî darê mezin dibûn, her yekî ji wan rêya jiyana xwe bi tenê girtibû.

Ta darê ber girt ez jî hêj çûçik bûm, piraniya demê



ez û zarokên tengdaşên min li bin darê dilîstin. Deng li min dikir û digot: Pelê darê jêmekin ku şîrikê wê nekeve çavên we, wê kul bike.

Mala pita min li hafa gund tevan bû, dara hejîrê piştî şiqindana wê siya xwe li ser gund û geliyê li kêlekê dikir, û kî ku de çûba, çavên xwe lêbûn. Darê weke pita min destê li pişta zarokên gund hemîyan xistibû, li mal bi mal gerî bû, wiha jî dara wê pîkên xwe dirêj hemî malên gund kiribû, û siya xwe lê belav kiribû.

Li dawiya havînê û piştî germa gergîn, kerikên wê bi rojan re dibûn nermele û şîrînî tê digerin. Gava dilê kê telme bixwesta diçûn kerik ji dara pitê jêdikirin, weke rojên xwe pê şîr dimeyandin, ne bes şîrik şîr dîmeyand, lê ji wan re dibû iksîra hemî derd û nexweşiyan û ew ji kufkiya civakê û jiyanê diparastin, şîrik dibû dermanê dermanan.

Havînek ji havînên xweş, dara bi şahiya dilê xwe şax dabû û pîk û xilfên xwe dirêj çûbûn. Her Pelek wê şûna cilek mûrî girtibû, siya xwe pehin û fere çûbû, dilê xwe ji şahiyê re dê ji sîng bi derketa heroj doza zemewend li siya wê li daketana, bihina zave û bûkê ji pozê neçûya, berê xwe di dev û zikên pêşmergên ji ber wê ve berxwedanê dikin ke, ji ber ku xelkê gund darê xwe bi xwe rêve dibin, û dilopên hingivê xwe diyarî wan dikir. Herojê malên gund dihat pêgerekiya xwe ji hejîran dibirin, jê lêçer, bastiq û jê hişk dikirin. Çiqas şêniyê gund hejîrên wê dixwerin ewqas bi wan xweş û şîrîn dibû, wek dayîkek zarokên xwe bimijîne dilê xwe şad û mezin dibû.

Lê pir mixabin Pita min wê havînê mir, şahî û xweşbexta wê bi serî nebû, û kizinî bi dil û cigerên wê diketin, weke sêwiyan pişta xwe dabû koka çiyê, Pelê xwe mîna guhên filan bi ser de çelmisî û xar bibûn. Heroj bi hilatina royê ji xew radibû û li çavê wê dinêr ta êvarê û bendewarê vergera pitê bû, heroj ev rewşa xwe bû. Lê ava hênik li ber dilê direşand, ku pitê nifşek ji ciwanan li şûn xwe gihêştibû berhemdan û ramana daykbûnê di wan de çandibû. Ev raman û hêvî mûm bûn di dil û hişê wê de veketibûn .....

# Dara Zaytûnê dipeyive!

**Melek Murad**



Ji berî ku neçar bibim û berê xwe bidim dewleta Turkiyê û koçber bibim, li bajarê Efrîna nazdar digel hevaleke xwe, me serlêdana Encûmana Niştimanî Kurdî, koma xwecihî li Efrirê dikir, û li wê derê wek derfeteke mezin bi dest me diket, em pêrgî endam û berpirsiyarê Encûmanê, rewşnbîrê gewre Dr. Ebidilmecîd Şêxo dihatim; piştî pirs, silav û lihevpirsînê, wî pirtûkek xwe di bin navnîşna ( Dara Zaytûnê dipeyîve û çema Efrînê, di bera re dişewite!!) Şanî min dida û ji min re weha digot: Wek dizanim ku tu jî, ji tor û wejeya zimanê kurdî hez dikî, tevî ku ev pirtûk hê ne amede ye jî, û lêveger jê re divê, vêca jî piştî xwendina wê divê tu li min vegerînî!

Hîngê ez pir şad dibûm ku ramangîrekî mîna Dr. Ebidilmecîd Şêxo pirtûka xwe şanî min dike. Bêgûman ev yeka ji bo min şahnaziyeke pir mezin e!! Nemaze dema çavên min, li navnîşa romanê diket, wê hîngê, wê gelekî bala min dikişand! Piştî vegeriyam malê, û ji berî her tiştî din, min ew pirtûk dixwend û Xwendina wê, û ji ber naveroka wê gelekî balkêş, bi eş û jan bû, dubare dikir. Lehengê romanê pir cefakêşî û welatperwerî diyar dikir. Lewre jî, dixwazim naveroka wê bi kurtasî bînim zimên:

Piştî Kurdistana başûr ava dibû, lehengê romanê didît ji erk û stobariya wî ye ku serlêdana wê bike, belkîm karibe xizmetekê di warê pisporiya xwe de ji wan re pêşkêş bike! Vêca jî bi xewn û pêjinên xweş û hêviyên pir bilind berê xwe dide başûrê Kurdistanê. Bi rê ve pir asteng, kelem û pirsgirêk di riya wî de serî hildidin. Wî bi dijwarî sînor dibirî û derbasî xaka Kurdistanê ya pîroz dibû! Lê mixabin, çi û çiqas mixabin, pişt re hêvî û armancên wî têk diçûn. Wisa jî, ew digel xewn û pêjinên xwe, bi dilekî şikestî û pir xemgîn li hembêza darên zeytûnê û Çemê Efrîna pîroz vedigere! Loman jî, Dara Zeytûnê bi êş û janên wî re dipeyive, û Çemê Efrîna bedew û nazdar jî di bere dişewite! Bûyerên romanê di vê çarçewê de bûn. Wê hinge, romana BÎRA QEDERÊ ya nivîskarê hêja nemir Mihemed Ûzun nizanim çawa bi bîra min dihat. Di romanê de jî, nivîskarê qedirbilind romana BÎRA QEDERÊ bi stîlekî xweş û coşeke pir bilind jiyana nemirê gelê kurd mîrê zimanê Kurdî Celadat Bedir-Xan nivîsandibû! Dr. Ebidilmecîd jî, bi stîlekî balkêş, zengîn û bi wateyên curbecur û hestên tenik, wî bûyerên romanê li hev hûnandibûn. Li dawî, dixwazim bi kurtasî bêjim ku, vaye şeş sal in, dara zeytûnê napeyive û hew; lê sedhezar car mixabin darên zeytûnan têne birîn, frotin û şewitandin ... hwd! Çemê Efrîna birîndar, gelî, newal, çiya, deşt û zevî mîna Çemê Cêrcim, geliyê Şiyê, Solavên Gemrûkê, gola Meydankê, Ava ziravikê û ... hwd, tev bi qîr û hawar dipeyîvin, ew bi destên dijimin û neyaran dişewitin û li benda roja serbestî û Azadiyê ne!

**Hejîra ... Dûmahîk**

û çîk şewq didan gora wê.

Zivistana li ber wê pir reş û giran bû, ewrên xwe ji kîna kûr kom serhev dibûn, û bayê tariyê ji zikreşan ve ber darê dihat hemî pelên wê yên kesk dişewitandin, qirikên reş dihatin hejîrên wên nikil dikirin ku pînka xwe têde çêbikin û canê wê yê şîrîn bixwin û tîjkên xwe jê bifirînin. Ew di xwe de dişewitî ji wê ye ku ew qirkina rûmet wê şikandine û dê ji hêkên wan çêlikên maran bi derkevin û zihêra xwe li hemî dinyayê belav bikin. Ku sê jiyanên dinya yên pêş, nihoyê û paş sûclî bikin.

Hemî rojên dara pitê bûne şev, hêstirên hingiv ji çavan dibarîn, hemî fere û folikên gund tijî kiribûn û dilopên sîrkê kerkên xwe kiribûnê, ji rojên bê re telme ji hingiv meyandibû.

***09.05.2023-an -Kempa Ostrum- Holenda***

## Li bajarê Heleb Roja Rojnamegeriya Kurdî hate pîrozkirin

Bi boneya Roja Rojnamegeriya Kurdî, herdu rêxistinên Partiya Demuqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê û Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, bi lidarxistina ahengekê, Roja Rojnamegeriya Kurdî bibîr anîn. Aheng bi beşdariya nûnerên partiyên siyasî, encûmen û saziyên gelêrî û çandî, kesayetên civaka sivîl, oldar, ... HWD, li bajarê Helebê hate lidarxistin.

Piştî demeke bêdeng û sirûda «Ey Reqîb», gotinek bi zimanê Kurdî bi navê herdu rêxistinan hate pêşkêşkirin. Semînarek derbarê rojnameya «Kurdistan» û rola ragihandinê di jiyana miletan de, hate xwendin. Piştî gotinên nûnerên partî, sazî û hin rewşenbîran, aheng bi deng û awazên mûzîkî bidawî bû.




# Hebûna Stranan û Nebûna Navî… ALAN BOTAN KÎ YE..?

**Baranê Cûmê**

Meydana hunera Kurdistanî bi navên hunerî dewlemend bû. Hin ji wan navên wê bi şêweyekî berfireh ketine dîrokê, li seranserî xaknîgariya welêt û cîhanê belav bûne, û hin ji wan ta niha li benda derfetekê ne ku ew jî bi şêweyekî werin naskirin. Bêguman, ew daxwaz û pilan yên her hunermendekî/ê ne, û nayê veşartin ku rola herî sereke di wê lîstikê de, rola ragihandinê ye. Erê ragihandin dikare propegandekê ji vî/ê yan wî/ê re çê bike, bihêle deng vede û ji aliyê gel ve were naskirin, kar û berhemên wî/ê werin nirxandin, lê mixabin! Hin hene ku, xista wan ya wekheviyê di alavên ragihandinê de, çi bi sedem çi bê sedem, tune bûn.

Di vê derbarê de, emê hin ronî bidin ser hunermendekî Kurd, yê ku bê şans û nesîba xwe ya dadmendiyê di derbara kar û hunera kurdî de bêpar maye, ew jî hunermendê hêja û nemir Alan Botan bû.



*Alan Botan (1959 - 2003).z*

Hunermend **Şahîn Muhsin Derwîş**, ê ku bi navê hunerî **Alan Botan** dihate naskirin, di sala 1959an de, ji malbateke welatparêz û ji biçûkiya xwe de bi êş û rewşa kurdan mijûl e, ji roja jidayîk bûye û ta roja ji nav me barkir.

Şahîn karîbû êş û azarên gelê Kurd di huner, helbest û stranên navdar re ji gelê Kurd û Kurdistanê re nivîsandibana û awaz jê re çêkirana, û gelek ji wan hunermendên bi nav û deng ji gotin û awazên wî strane wek:

Şivan Perwer û Ciwan Haco bûn, wek strana:

**Min bêriya te kiriye.**
**Serhildan Jîyan e.**
**Lo me çikir me çikir.**

Û du awaz ji du stranên ji gotinên Şêrgu Egîd re jî danîbûn, lê li ser daxwaza wî li ser qabê nehatibûn nivîsandin, ew jî ev bûn:

**Hevalno.**
**Wa hatin pêşmergên me.**

Û awaza strana Ciwan Haco ya bi navê **Gula Deviya**, gotin ên Şêrgo Egîd bûn.

Şahîn karîbû Elboma xwe ya yekemîn bi navê **Şîn û Şadî** berî nexweşiya xwe bi çend mehan derxista, komek stranên xweş ji gotin û awazên wî bûn, û ta qaba derve jî wî danîbû. Ew bi xwe wênekêş û xêznivîs bû jî, mixabin piştî Albuma wî derket, ew nexweş ket, û pênc salan di bêhişiyê de ma. Pişt re, li sala 2003iyan, ji dunyayê barkir.

Şahîn gelekî erênî û jêhatî bû, wêrek û canfeda bû, hunermendekî dewlemend û nirxbilind bû. Eger ew îro li meydana hunerê baya, wê gelek berhemên wî hebana.

Yekemîn hunermend bû ku li ser Şehîd **Silêman Adî** straye ew bû; wî awaz û gotinên Silêman danîn û wî xetera girêdana mirov bi rêjîmên li dijî Kurd û Kurdistanê di riya strana Lo me çi kir, ya Şivan Perwer re his dikir.


Ji bo Şehîdan stra
Ji bo girtiyan stra
Gelek ji bo Kurdistanê stra, û her kêliyê di jiyana xwe de hêviya wî rizgarkirina wê bû.

Ji mafê wî hunermendî ye ku, jiyana xwe ji bo huner û xizmeta gelê xwe bexş kiriye û gelek stran û hunereke xweş pêşkêş kiriye; jibîr nebe û were bîranîn.

Hezar rehme li giyanê te bin hunermendê nemir.

----

***Bi pênûsa Şêrgo Kenan Egîd- Medarat Kurd.***
***Wergerandin ji Erebî***



*Wêneya «Alan Botan» ji rojnameya Swêdî «Nynäshamns posten» - sal 1995 an*

## Xwendekarên Tirbespî û Gundewarê Wê Hatin Xelatkirin

Rêxistina Tirbespî ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) şagirtên serkeftî ku bawernameyên xwendina bingehîn (nehem) û xwendina amadeyî (lîse) ji hemî dibistanên Tirbespî û gundewarê wê, wergirtine, bi seredana malbatên şagirtan. Hejmara şagirtên ku hatin xelatkirin 62 xwendekar bûn, ji wan 38an bawernameya pola nehemîn û 24an jî bawernameya lîseyê wergirtine. Tê zanîn ku şagirtên xelatkirî ji xwendekarên dibistanên Rêveberiya Xweser û dibistanên girêdayî rijîmê ne.







# Tûrikê Çîrokan ji bo Zarokan

**Wergerandin ji Erebî: Mistefa Hennan**

### 1.Çîroka yekê.

### ((Roj û Ba ))

Rojek ji rojan dibêjin ku Ro û Bê/bayî ve, bi hev re ketin qerezan û gotin: Ka em binêrin kî ji kê hêzdartir e. Bê kire guveguv û got: Ez hêzdar im!

Royê got: Na, ez bihêz im. Herdiyan got, ka em huner û hêza hev bibînin.

Bê dîsa kire guveguv, toz û telaz rakir, bapeşk rabû, dar hejiyan û pelên wan weşiyan; û bê bi pozbilindî ji royê re got: Va te hêza min dît, ez ji te hêzdartir im!

Roya ku tîrêjên xwe yên zêrîn berdabûn ser gir û çiyayên bilind, rûken bû û got: Bayo! Te xwe pir dîtiye ha! Ez ji te hêzdartir im! Eger tu ji min bawer nakî, tenê li rûyê min meyzeke. Lê dîsa Bê got: Na! Ez ji te hêzdartir im. Royê jî Got: Na ez. Bê got: Ka Em binêrin, kî ji kê bihêztir e?.

Royê got: Bila be.

Royê got: Ew mirovê han, ê ku perdesûn li xwe kiriye, tu wî dibînî?

Bê got, belê min ew dît.

Royê got: Ka kî ji me dikare perdesûnê wî jê bike!

Bê dîsa kir guveguv û bapeşk rabû, hemahema dikir dar ji kokê de hilbibin, perdesûnê mêrik jî li vî alî diket û li wî alî diket, lê dihat hev û vedibû; lê her



ku ba bihêz dibû, mêrik perdesûnê xwe bêtir li xwe daland û bernedida .

Ro kenî û gote bê: Va ye te nikarîbû perdesûn jê bikira. Tu li min meyzeke ez ê çawa bikim, ku bi hêsanî ew bi xwe perdesûnê xwe, ji xwe dîne.

Royê tîrêjên xwe yên germ û bi tîn ji jor de berdan, rûçik û canê mêrik bi tîrêjên xwe yên zêrîn germ kirin, mêrik xuh da û nikarîbû xwe li ber germ û tava royê bigirta, û daku xwe hênik bike, rabû pişkovên perdesûnê xwe yek bi yek vekirin; lê, royê hîn tîrêjên xwe germtir kirin, laşê mêrik jî sist bû, xuhdan di ser eniya wî re herikî, rabû perdesûnê xwe ji xwe kir, danî ser milê xwe û bêhneke vehesê ye kûr kişand.

Ro kenî û got: Ha... Ha... Haaaa. Ba jî di cih de fiş bû, rawestiya û bê deng ma...

----------


***Ji pirtûka (Li dibistanê) - Çend Nivîskarên Rûsî***

# Alfabe

**Nivîsandina bi tîpên Aramî: Mueyed Tayib**
**Veguhastina tîpan bo latînî: Mustafa Hannan.**

Li Mezopotamiya, anko axa di navbera deşta herdu rûbarên Dicle û Ferêt de, ku Îarqa îro ye, berî nêzîkî pênc hezar (5000) sal, mirovan nivîsandin afirandiye, û bi afirandina nivîsandinê re, dergehên nû li ber mirovatiyê vebûn, û em îro bi rêka wan nivîsan gelek tiştan derbarê jiyana xelkê wê serdemê dizanin, digel ku ew bi hezarên salan berî me jiyane.

Helbet nivîsa wê



| | لاتینی Latînî | کریلی (КЪРИЛИ) | عەرەبی | | لاتینی Latînî | کریلی (КЪРИЛИ) | عەرەبی |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ١ | A a | Aa | ئا | ١٨ | M m | Мм | م |
| ٢ | B b | Бб | ب | ١٩ | N n | Нн | ن |
| ٣ | C c | Щщ | ج | ٢٠ | O o | Оо | ۆ |
| ٤ | Ç ç | Чч | چ | ٢١ | P p | Пп | پ |
| ٥ | D d | Дд | د | ٢٢ | Q | Qq | ق |
| ٦ | E e | Əə | ە | ٢٣ | Rr | Рр | ڕ |
| ٧ | -- | Ә̄ә̄ | ع | ٢٤ | Ss | Сс | س |
| ٨ | Ê ê | Ее | ێ | ٢٥ | Şş | Шш | ش |
| ٩ | F f | Фф | ف | ٢٦ | Tt | Тт | ت |
| ١٠ | G g | Гг | گ | ٢٧ | Uu | Ŏŏ | و |
| ١١ | H h | h h | ه | ٢٨ | Ûû | Уу | وو |
| ١٢ | H h | ḧ ḧ | ح | ٢٩ | Vv | Вв | ڤ |
| ١٣ | I i | Ъъ | - | ٣٠ | Ww | Ww | و |
| ١٤ | Î î | Ии | ی | ٣١ | Xx | Хх | خ |
| ١٥ | J j | Жж | ژ | ٣٢ | -- | Ѓѓ | غ |
| ١٦ | K k | Кк | ك | ٣٣ | Yy | Йй | ی |
| ١٧ | L l | Лл | ل ڵ | ٣٤ | Zz | Ээ | ز |

serdemê û ya niha ne wek hev in, û ev şêweyê ku evro em pê dinivîsin, di gelek qonaxan re derbas bûye û gelek guhertin tê de hatine, heya ku rengê xwe yê îro wergirtiye.

Nivîsîn çi ye?

Nivîsîn wêneyê axaftinê ye. Axaftin ji dengan çê dibe, nivîsîn jî ji wêneyê wan dengan durist dibe. Em ji wêneyên wan dengan re «tîp» dibêjin; tîp jî alfabeyê pêk tînin.

Di cîhanê de gelek alfabe hene wek alfabeya Latînî, Erebî, Siryanî, Ibrî, Kirîlî…hwd. Lê, ji hemiyan navdartir, alfabeya Latînî ye, ya ku gelek ziman pê têne nivîsandin wek Îngilzî, Firensî, Almanî , Îtalî ,….hwd.

Zimanê kurdî bi gelek alfabeyan hatiye û tê nivîsandin, wek alfabeya Aramî, Kirîlî û Latînî. Kurdên Kurdistana Îraqê (Başûrê Kurdistanê) û ya Îranê (Rojhilatê Kurdistanê) bi alfabeya Aramî dinivîsin. Lê, Kurdên Kurdistana Tirkiyê (Bakurê Kurdistanê) û ya Sûryayê (Rojavayê Kurdistanê) bi alfabeya Latînî dinivîsin. Kurdên Sovyetistana berê bi alfabeya Kirîlî dinivîsandin(1). Lê, niha zimanê Kurdî tenê bi du alfabeyan tê nivîsandin: Aramî û Latînî.

Dê gelek baş be, em Kurd hemû bi yek alfabeyê binivîsin, lê heta hîngê ya baştir ew e ku, em xwe fêrî herdu alfabeyan bikin.

---------

*1- Piştî têkçûna Yekîtiya Sovyetê, Kurdên wan komaran bi alfabeya Latînî dinivîsin.*

Jêder: Kovara “ Kepir ” jimar 3, rûpel: 21.13.

Wêneyê tîpan ji kovarê ye.

# Xelata Pakrewan «KEMAL HENAN» ya Sala -2024 an Ji nivîskarê Kurd Berzo Mehmûd re hate pêşkêşkirin






Îsal, sala 2024-an, «Komîta Xelata Kemal Henan» nivîskarê Kurd mamoste Berzo Mehmûd layiqê vê xelatê bijart.

Ahenga Roja Rojnamegeriya Kurdî de, ku îro, 22.04.2024-an, li Navenda Partiya Yekîtî Ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê «YEKÎTÎ» li Qamişlo, bi beşdariya birek rewşenbîr, nivîskar helbestvan û hezkirên zimanê Kurdî lidar ket, ji bal Komîteyê ve, xelat radestî Mamoste Berzo Mehmûd bû.

Hêjayî gotinê ye ku Berzo Mehmûd, di warê nivîsandina bi zimanê Kurdî de, xwedî dîrokeke berz û naskirî ye. Wî ji salên 1980-yî de, di desteyên Kovarên bi zimanê Kurdî yên wê demê de li Sûriyê derdiketin, mîna Gelawêj, Pirs û Hevind, kar û xebat kiriye, nivîs, berhem û lêkolînên wî, rûpelên wan xemilandine. Heşt pirtûkên wî bi zimanê Kurdî û çend berhem bi zimanê Erebî jî çap û belav bûne; ji bilî dehan gotar û lêkolînên zimanasiyê ku di kovarên Kurdî de bi zaravê Kurmancî û Soranî hatine belavkirin, û niha 2 pirtûkên wî bi zimanê Erebî û 3 pirtûk bi Kurdî jî bo çapê amade ne.

Em vê xelatê li mamoste Berzo Mehmûd pîroz dikin û hêvîdar in ku bi berhemên xwe her ew pirtûkxaneya Kurdî dewlemend bike.

**Komîta»Xelata Kemal Henan»**

*Qamişlo 22.04.2024*

## Xelata Zêrîn «Bile» ji bijîşkê Kurd Ciwan Hemê re hate pêşkêşkirin




Xelata Zêrîn «Bile» - 2024, ya Xebatkar û nivîskarê Kurd ê dengewar Ibrahîm Ehemed, Bavê Hîroxan, hevjîna têkoşerê Kurd ê bi nav û deng, Serokomarê Îraqê Celal Talebanî ji bijîşkê Kurd Ciwan Hemê, ji Rojavayê Kurdistanê, re hate pêşkêşkirin weku bijîşkê ku herî bêtir xizmetguzarî ji nexweş û birîndarên sivîl û serbazên Kurd re pêşkêş kirine. Ev xelat li bijîşkê Kurd Ciwan Hemê pîroz be!

## Partiya «Pêşverû» û «Yekîtî» bi hev re agirê NEWROZê pêxistin

Di çarçewa geşkirina xebata hevbeş di navbera herdû partiyên bira de, Partiya Pêşerû ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê û Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ), di vê mehê de, di bîstin w,vemîn salvegera Kuştara Yarîgeha Qamişlo de 12.03.2004-an, bi beşdariya serkirdayetiya herdû partiyan li Navenda Partiya (YEKÎTÎ) li ser rewanê pakrewanan mûm hatin pêxistin.

Herweha, di şeva cejna netewî NEWROZ de jî, bi beşdariya Sekretêrên herdû Partiyan, bi birêz Dr.Ehmed Berekat û Mihyedîn Şêx Alî, li navenda PDPKS agirê Newrozê hate pêxistin, birêz Mihyedîn Şêx Alî gotinek bi zimanê Kurdî ji beşdaran re pêşkêş kir û bi dîlan û stranên folklorî cejin hate pêşwazîkirin.

